

Dadgehîkirina
tawanbarekê

»»» R:11



Ne bixêr hat û
ne jî dê bi xweşî
here

»»» R:3



Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (372) 20-04-2020 Buha (1000) Tûmen


COVID-19 û
aboriya Îranê

»»» R:4



122emîn salvegera
rojnamevaniya Kurdî

»»» R:6



Çepiklêdan bo pêşmergeşên “Spîpoş”

Di rojên derbasbûyî de û piştî belavbûn û berfirehbûna nexweşiya Korona li Îran û nemaze di Kurdistanê de, ku hevdem bû digel guhnedana Navendên Pêwendîdar ên hikûmetê li derheq dabînkirina bûdce û kelûpelên hewce yên pizîşkî û herwsia canjîdestdana çendîn kadr û pizîşkên dermanî li Îran û Kurdistanê, hewleke rêzgirtinê bo ked û mandûbûna wan kasane li Kurdistanê deşt pê kir û carek din Kurdistanê pêşengbûna xebata xwe li dijî pîsatî û xebat ji bo karê bikom û xebata medenî nîşan da.

Gerçî berpirsîyarên hikûmetî hemû hewleke xwe dan ku nexweşiya Koronayê di bajarên Îranê û nemaze Kurdistanê de belav bikin û ber bi belavbûna wê negrin, lê hewla “xorisk” û cihê rêza xelkê hem bo dijegemarkirina gund û bajarên û hem jî bo pêdiviyên dijegemarkirina mal û cihên giştî û herwisa gihandina alîkariyên madî û hewcehiyên jiyanê bi kesên kêmdahat re di piraniya bajarên Kurdistanê de ew qasê hişyarî û morala gelê me nîşan da, û carek din derxist ku Kurdistan bi riha mirovî



ve mêzeyî em wekî xwe dike û dîsan Kurdistan bû mînamek bo mirovayetiye!

Bilî wê jî piştî belavbûna nûçeyên talankariyên rejîmê ji navendên dermanî û pizîşkî, û di halekê de ku Kurdistan xembarê jîdestdana çend kadrê dermanî yên xwe bû, û komê ji çalakvanên medenî û siyasî di navxwe û derveyî welat de bi merema bilindnirxandina kar û çalakî û xizmeta duktur û pereştar û hemû ew kesane ku di wê warê de bi hawara xelkê ve çûne, kempênêk li jêr navê “Parêzvanên Jiyanê” û bi silogana “Pêşmergeşên Spîpoş, qet nayêne jibîrkirin”, bo roja Înê 22`ê Xakelêwe demjimêr 10`ê şev bi dema Rojhilatê Kurdistanê ragihand, da ku bi hatine derê ji malên xwe yan jî li ser banên xwe bo heyama xûlekê bi çepiklêdanê piştevanî ji wan bikin ku ew kempêne piştgêriya rastewxwe a Navenda Hevkarî a Partiyên Kurdistanê Îranê li pey xwe ve aniye.

Her di vê derheqê de rêzdar Lêpirsîyarê Giştî ê PDKÎ, “Mîstefa Hicrî”, rû li civatgeha pizîşkî a Kurdistanê peyamek li ser hesabe xwe a “Twitter”ê belav kir ku tê de hatibû: “Di çalakiya bawerî bi xwe hebûnê de li dijî Koronayê, ew pêşmergeyên ku kincên spî li xwe dîkin, ji bo paraştina jiyana welatiyan di çeperên herî pêşîn yên cangorîtiyê de ne. Pêşmergeatiya we pîroz be xortên xebatkar yên welat. Rojhilat rêzê li we digire û we ji bir nake.”

Vê yekê jî wisa kir ku careke din xelkê Kurdistanê bi kiryar îsbat bikin ku cuda ji hikûmeta dagîrker jiyan dîkin, hizir dîkin û biryar didin, roja Înê 22`ê Xakelêwe, demjimêr 10`ê şev xelkê Rojhilatê Kurdistanê ji bo rêzgirtinê ji civatgeha pizîşkî a Kurdistanê li bajarên Kurdistanê yên wekî, “Bokan, Pîranşehr, Sine, Merîwan, Mihabad, Seqiz, Şino, Bane û Neqede û gundên Jaweroya Sine”, xûlekê çepik lêdan û rêz li Pêşmergeşên “Spîpoş” ên Kurdistanê girtin.

Ev rêzgirtinane di şevên din de jî berdewam bûn û xelkê emegnas ên Merîwanê, carek din bo rêzgirtinê ji hewl û tekoşîna pizîşk û peresdar û kadrên dermanî, di êvara roja Duşemî, 25`ê Xakelêwe de, demjimêr 9`ê şevê, çend xûlekan çepik lêdan û bo careke din, rêz ji cangorîkirina Pêşmergeşên “Spîpoş” girtin.

Ew hewla wan ya cihê rêzgirtinê di demekê de ye ku, rejîma zordar her wekî demên berê yên derbasbûya xwe ya pir ji tawan, mijûlê belavkirina derevan û amarên çewt û veşartina dizî û talan û tawankariyên xwe ye.

Bi kurtî, heyameke zêde ye ku Kurd û rejîma dijîgelî a Axûndî, rêya xwe ji hev weqetandine ku mezintirîn û berçavtirîn a wê yekê, ew bû ku hate baskirin. Ji aliyeke din ve, hêza gel hewla avdankirin û binyatdanîna welateke avedan dide û ji aliyeke din ve, rejîma wêranker hewla jinavbirina wê dide; Ji wê aliyeke gel biryara paraştina xelkê xwe dide û ji aliyeke din jî rejîm biryara gemarkirina wê dide. Di wir de ye ku em dikarin bibêjin ku Kurd hizra welatê xwe piştî Koronayê û Koronayan dike.

Sergotar



N: Kerîm Perwîzî

Serdemanekê, ji hatina belaya Xumênî bo nav Îranê de, hin kesên nezan dabûne zanîn ku wêneya Xumênî di nav heyvê de tê dîtin û di niha de jî ji hatina belaya Korona bo Îranê, li ser bingeha wê şewaza nijadperestane, emrazên peydakirina vîrûsê di mewdaya 100m de pêşan didin!

Deştpek û dawiya wê rejîmê yek tişt e û ew jî henekkirin û sivikatîkirin bi zaniştê ye. Di her bela û malwêranîyekê de jî, yekem qurbanî zanişt û têgihîştin e û eva ku bi berde-wamî tê berfirehkirin, “xurafat” û gêjbûn e. Çavkaniya rejîma Wilayeta Feqîh bi nezanîne ve tê avdanîkirin.

Demek ku xelkê Îranê ji zilma siyasîyê desthilata Pehlewî bêzar bibûn û bav û kur, Riza û Mihemedriza, 50 sal zilim bi wê xelkê kiribûn û hemû gelên Îranê tepeser kiribûn, xelk êdî li pey azadiyê û rizgarkerê xwe bûn. Di wan cure deman de ku xelk seha bêhêziyê dîkin û bedbextî pêsîra wan digre, li pey pencereyêke biçûk digerin ku hêviyê bibexşîne. Di sala 1357 a Rojî de û nemaze di wê serdemê de ku emrazên gihandina zaniyariyan gelek ji ber deşt nebûn û nezanîna hindek xelkan dibûne çavkaniya nanderanîn bo fêlbazan, wisa hate belavkirin ku wêneya Xumênî di nav heyvê de hatiye dîtin û bi wî awayî rûyeke sihrayî bi Xumênî yê tawanbar bexşî, lê di kiryar de Xumênî heman kes bû ku digot bişkinin wan pênûsan û bibirin wan ziman û fermana cîhadê li

Sivikatî bi zaniştê

dijî Kurd da.

Di niha de ku belaya Korona hatiye û pêsîra neteweyên Îranê girtîye, dúbare rojreşî û bêçareyî givaş bo wan anîye û xelk li pey pencereyêkê bo rizgarkirina canê xwe digerin.

Dúbare belayek din jiyana xelkê ji wan kire jehra tal û bo bideştanîna pariyek nan dibe dehan meydanên mînrêjîrî yên Koronayê derbas bikin û ji wê hindê xatircem nînin ku şev bi saxlemî dizivirin cem zarokên xwe yan jî ne?

Di rewşên wiha de Spaha Pasdaran û demudezgehên rejîmê ku bi veşartina raştiyan û bi siyasîyê xwe yên dijî mirovî, belaya Koronayê wek xelat bo xelkê anî, û di dema ku çî deştê wan nayê hawara xwe dibine ber kevnarperwerî û xurafatan.

Belaya Koronayê deriyê cihê kasibkariyê û ziyaretgehan li rejîma Îranê daxişt, lê bi awayekî din her dixwazin dijayetiya zaniştê bikin û rojane berhemên dije zanîn û hişyarî di nav bazaran de belav dîkin.

Wezareteke wekî Wezaretê Tendirûstî ku dibe zaniştirîn dezgeha hikûmetî di Îranê de be, ji deştpekê ve heya niha dehan raporê nezaniştî daye û heta li deştpekê digotin ku wan dermanê rasteqîneya Koronayê peyda kirine û heta dê bo derve jî bişînin! Yan parek ji nezanperestên haki-myetî wisa bas dikin ku nexweşiya Korona nagihe mezargehan, û baregehên Qum û Meşhed bi



xwe dijî Koronayê ne!

Nezanperestî û xurefat di du cihan de gihîştîye lûtke! Wê dema ku Xamineyî bi ew qasê nezanî û bi neçarî ku herifîna rejîma xwe bi çavê xwe dibîne, hasara xwe bo “Cin”an bir û ragihand ku wan “Cin”an êrîşê ser rejîma wî kirine! Di raştî de eve mêjiyê Xamineyî bixwe ye ku “Cin”an deştê xwe lê daye!

Di rojên derbasbûyî de jî, Spaha Pasdaran bi bêşermiyê ve, emrazeke peydakera “filêz”î anîbû ku berê bo peydakirina zêr û xezîneyan di nav goristanên Îranê û bo talankirina şûnwaran mî-fah jê werdigirtin! Ew emraz a peydakirina “Filêz”an wekî peydakerê Korona pêşan didan ku ji dûriya 100m ve, vîrûsa Koronayê peyda dike!

Ew kiryara Spaha Pasdaran ew aliyê natewaniya wan e û herwisa bi gêlzanîna xelkê nîşanê rejîmê da û belkî besîciyekî bêmêjî bawer bi axavtinê Spahê bike, lê hemû cîhan dizane ku Spah mijûlê direw û belavkirina xurefatan e. Her çawa Encûmena “Fîzîk” a Îranê ragihand ku ev kiryara Spaha Pasdaran henekkirin bi sînorên zaniştê bû û herwisa “Fîzîk”zaneke din got, bi wê karê Spaha Pasdaran hemû cîhan ji Îranê û Spaha Pasdaran dikene.

Çil sal e ku ew rejîme tenê xurefatan belav dike û sivikatiyê bi hemû deştetên zaniştê dike, lê niha hemû cîhan agehdarê nezanî û nezanperestiya wan bûye.

Ne bixêr hat û ne jî dê bi xweşî here



N: Serbest Urmiye

Korona siwareke serkêş e ku welat bi welat ajotiye. Li her sînorekê ku derbas bûye, xelata wê xêncî êş û mirinê ne tişteke din bûye. Jordeçûna roj bi roj a nexweş û goriyên wê di cîhanê de heta diçe cîhan û mirovahiye pitir ber bi rûyê metirsiyan dike. Renge qerentîne, avêkirinê û daxistina sînoran heya qasekê pêşiya tunda-joyiya wê astengê girtibe, lê dîsan jî hejmara nexweşan her zêde dibe. Bi terzekê ku cîhan di tev aliyan de ketiyê bin bandora wê de û di çend hefteyên yekemîn de bandora we li ser tev aliye jiyana mirovahiye xuya dike. Lewma berfihêhbûna wê û encamên wê yên nerênî ku heya niha hatine xuyakirin, hizra cîhana piştî koronayê dixê mejiyê mirov de. Ka gelo çi pêşerojek li benda mirov û cîhanê ye, piştî derbaskirina krîza koronayê.

Berî ku em herin ser vê basê, gotinên prîfsor “Joseph Nye” ê Amerîkî li dor cîhana sala 2020`an li konseya zaniyariyên neteweyî ya Amerîkayê, balkeş in. Li gor gotina wî sala 2007`an a Zayînî de, di konseya zaniyariyên neteweyî yê Amerîkayê de, qala sîstema cîhanî bo sala 2020`an şûn de hatiye kirin. Ew dibêje me çar têdîtin li ser cîhanê hebûn. 1- Eva bû ku cîhanek bû li ser bingeha aborî, ev jî li ser esasê bi cîhanîkirina aborî û bi beşdariya ber çav a welatên Asiyayî. 2- Cîhanek bi serdestiya Amerîkayê ku dewletên yekbûyî yê Amerîkayê bi ser de zal be. 3- Cîhanek Ayînî ku têde li ser deştê xelafetên ayînî serên navxweyî serhildin.

4- Cîhanek pir ji tirs û xof ku hêzên dijberî bi cîhanîbûnê dê ewlehiya cîhanê tevlîhev bikin û sîstemekê zal bikin ku têde dîktatorekî zîrek yan jî serokê hêz û partiyekê hakim be.

Lê Koronayê ev hemû tevlîhev kirine û rewşeke wiha pêk aniye ku meriv hemkûfê xwe weke dijmin mêze dike, dijminek ku çeka bikuj a Koronayê bi wî re ye. Heya qasekê cîhan tevlîhev kiriye û bandora nerênî li ser tev aliye jiyânê daniye.

Bi kurtî encamên wê heya niha wiha hatine şirovekirin:

Di warê aborî de rewşeke wiha pêkaniye ku “Angela Merkel” Şêwirmenda Almaniyayê, wê weke krîza herî mezin a piştî şerê duyemîn ê cîhanî dide zanîn. Kongreya Dewletên yekbûyî yê Amerîkayê jî heya astê 2 tiriliyon dolaran bo berhingariya wê pesend kir. Ji nizimbûna bihayê niftê ve bigire heya daxistina hotel û xwaringehan û kargehên berhemanînê di warên cuda de, texmîn tê kirin ku pêleke mezin a bêkariyê li pey ve tîne. Ji aliyeke din ve pareke zaf ji çalakvan û hizirmendên aborî, çar dîtin li cîhana piştî koronayê hene. 1- Vegeriyana meriv bo serdemên kevin. 2- Sermayedariya bihêz a dewletî. 3- Sosolîzma tundajo ya dewletî. 4- Peydabûna ci-vakan li ser bingehe alîkariyên wekhev.

Di warê çandî de jî bê bandor nemaye û ji zanîngeh, dêr û mizgeftan ve bigire heya mêvandarî û şîn û şahiyên hemû qedexê kirine. Metirsiya vê hindê heye ku cîhana piştî Koronayê meriv tûşî xewlebûn yan xwe xewlekirinê bike.



Di cîhana siyasî de jî vîrûsa han heya dewletên demokrat jî neçar kirine ku hindê caran alavên zordariyê bikar bînin. Dewlet neçar kirine ku çavdêriya pitir bi ser jiyana xelkê de bikin û hikmê xwe bisepînin. Hizra vê heye ku renge piştî vê krîzê, aliye totalîter û netewexwazên tundajo werin ser kursiyên deştîlatê. Ya heya niha pitir cihê ramanê ye, eva ye ku tîrsa vê çendê heye ku dewletên dîktator serkevîneke zêde bi deşt ve bînin. Çimkî gellek caran tê gotin ku serkevîna welatên ku hêsta bi tevahî demokratîze nebûne, bo kontrolkirina Koronayê berçavtir e, nemaze di welatên ku bi navê cîhana sêyem tîr naskirin de. Helbet ezmûna rabûna xelayê û serhildana nexweşiyên wiha bê derman bi taybetî piştî şerê duyemîn ê cîhanî ku bûne sedema serhildana hindê dewletên zordar û dîktator, bo mînak dewleta Rîza Şah ê Pehlewî di Îranê de, vê hizrê xurtir dike. Herçend ku peydakirina dermanê vê êşê jî dikare heya qasekê siyaseta dewleta ku derman peyda kiriye zal bike bi ser cîhanê de.

Bi kurtî ji ber ku heya niha çi çareseriyek ji vê êşê re peyda nebûye, dibe ku zû peyda nebûna çareseriyê cîhanê raştî krîzekê bike ku bi ser du beşên cîhana pêş û piştî Koronayê de parveke. Lê ya herî girîng ku dikare wêneyeke serrast li cîhana piştî Koronayê eşkere bike, biriyarek e ku dê gel û dewletên cîhanê di vî heyamî de bidin.

COVID-19 û aboriya Îranê



N: Dara Natiq

Bertengbûna roj li roj zêdetir a dorpêçên aborî bo ser Îranê û veguhasîna armancdar a “Coronavirus” nexweşîya (COVID-19) ji aliyê rejîmê ve bo nava civatgeha wî welatî, xîm û bingeha aborî a welatê Îranê bi temamî hilûşandiye û welat bi krîzek mezin û di rewşek dijwar de derbas dibe. pawanxwazî û siyaseta şerxwazî û kiryarên tundûtîj û terorîstî ya rejîma Îranê barek giran xîstîye ser milê civatgeha Îranê û jiyan xelkê belengaz yê wî welatî bi sedema şaşitî û bê kifayeti a rayedarên welêt di rewşek pir aloz û bi zehmet û dijwar de derbas dibe.

Serbarê vê reşa han a dijwar û xirabbûn û hilûşîna bingeha aboriya welêt, veguhastîna armancdar a “Coronavirus” nexweşîya (COVID-19) ji aliyê Spaha terorîst a Pasdaran ve bo nava civatgehê, astengî û girêpêçkên li hember aboriya welêt zêdetir kirin û barê herî giran û zirara herî mezin ji ber xelkê belengaz yê wî welatî ket.

Berfirehtir bûn û geşekirina Coronavirus nexweşîya (COVID-19) li tewahiya Îranê çalakîyên aborî yê wî welatî bi temamî xîstîye bin bandora xwe a nerênî. Li gor rapora Odeya Esnaf a Îranê, bi sedema wê nesaxiyê û belavbûna wê li tev civatgeha Îranê, ji wan 3 milyon û 300 hezar yekeyên çalak yên aborî li Îranê zêdeyî 2 milyon û 600 hezar derfetên karî dikevîne bin bandora wê vîrûsa han û derfetên karî ên xwe ji deşt didin.

Daxîstina hejmarek zaf ji navend û derfetên kar û kasbiyê, kêmbûna hat û

çûyîne, bi zûrî ragirtina xelkê li malên xwe, bê bawerîbûna zêdetir ji nîzamê û bêderamedî a xelkê, kêmbûna daxwazên berhemanîn û daxîstina û mayepûçbûna zaf ji kompanî û navendên berhemanînê, girêdana rê û derwazeyên bazerganiyê bi rûyê wî welatî de, arîşe û astengiyên ser rêya hinartina alavên xeyre neftî bo welatên cîran, bê nirxbûn û erzanbûna roj li pey rojê a bazara nefta a cîhanê, bandorek raşterast li ser wê hin bazara nefta Îranê ku bi dizî û bi awayek neyasayî difrot daniye. Ji aliyek din ve bîrîxbûn û hatina xwarê a buhayê eriz li Îranê û nebûna bûdce û jêhelçûna xercî û hezîneyan û kêmkirina berçav a dahatê, û gelek diyardeyên din bi sedema “Coronavirus” nexweşîya (COVID-19), barek giran xîstîye ser milê xelkê wî welatî û hindêy din bingeha aborî a welêt wêran û ji berhevhişanî ye.

Li gor rayedarên Oda Bazirganî a Îranê, di rojê de bi hegera daxîstina nûsîngeh û navendên bazirganî yên mezin li seranserê welêt de, bayê 164 milyon dolar zirar digihîje wan û herwisîna daxîstina dukanên biçûk û kerya taybet jî bi dûr ji wê zirara han nînin û hemî di bin bandora nerênî a wê diyardeyê de ne. Li du hefteya deştîpêka Îranê bi “Coronavirus” nexweşîya (COVID-19), bazara bors a pişka buha giran a Tehranê bi rêjeya %3.44 daket û eve di demekê de ye ku di heman demê de jî buhayê diravê Îranê jî bi sedema sizayên aborî bo ser wî welatî %19 buhayê xwe ji deşt da.

Rejîma Îranê ku piştî dorpêçên Amrîkayê bixasmanî bo ser bazar û hinardekirina nefta wî welatî, hewil da ku kêmbûna bûdceya hikûmetê li ser bingeha bilindkirina nirxa benzîn û malîyatê û hinardekirin û dahata bazara xeyrê neftî a wî welatî tejî bike, li ew pîlan û pirojeya



nîzam, kete bin bandora nerênî a “Coronavirus” nexweşîya (COVID-19) ku Spaha pasdaran a Îranê bi awayek armancdar û bo tepeser kirina xelkê Îranê û berengarbûna li hember meşên nerazîbûna xelkê li nîzamê û zext û givaş xîstina ser civatgeha navneteweyî bona şikandina dorpêçên aborî yên ser wî welatî bi merema xebat bo ji nav birina “Coronavirus” nexweşîya (COVID-19).

Hikûmet neçare ku serbarê vê krîza xirab a aborî û hebûna bûdceya kêmtir û nebûna dahat û girêdan û daxîstina tev deriyên hinarde kirinê, ji bo rû bi rû bûna bi vîrûsa malwêranker a “Corona”yê, hezîneyek zaf bide û ew yek jî hem barê ser milê hikûmetê di vê zirûfa bi krîz a aboriya welêt de zêdetir dike û hem jî hindêyê din rewşa aborî a welat aloztir dike û tev nîşane û rewşa aloz a heyî vê yekê ji me re didin xuyakirin ku sala 1399’an a Rojî, bi bertengbûna roj li pey rojê a dorpêçên aborî û belaya malwêranker a “Coronavirus” nexweşîya (COVID-19), salek pir dijwar û bi zehmetir dibe ji bo rejîma Îranê û nemaze barê jiyan û guzerana xelkê belengaz yê wî welatî dijwar û asteng û girêpêçkên ser rêya civatgehê mezintir û berfirehtir dike û sitûn û bingeha aboriya welatan bi tewahî ji berhev dihişîne.

Kilîda çareserkirina pirsê kurdî li Sûriyê



Ebdulêzîz Qasim

dem ku PYDê tevî siyaseta û îdeolojî û desthilata xwe ya tekalî bicarekî tîk şikest li ser hemû aştan di paraştina mîletê kurd û xaka Kurdistanê Sûriyê de.

Li gorî daxuyaniyên berpirsên ENKSê, ku di hevdîtin û gerên diplomatîk yê wê ligel hin welatan di nav de bi taybetî li gel Amerîka û Rûsya û Fransa û Birêtaniya ... hwd ku van hemû alîyan yekrêziya kurdî wekî mercekî serekî ji bo piştgiriya pirsê kurdî li Sûriyê dane zanîn, herwiha ku ji aliyê wan û bi taybetî Amerîka gelek fişar li ser PYDê û HSD hatine pêkanîn ji bo yekrêziyê, û heman fişar li ser ENKSê jî hatin pêkanîn ji bo vekirina ofîsên xwe, û dîsa ku destpêşxeriya fermanîdarê HSD, jeneral Mezlûm Ebdî hat di çarçoveya encamên van fişaran de, yekser piştî dagîrkirina Serêkaniyê, û li gorî hin nûçeyên nefermî rast yan derew ku heta rejîma Sûriyê li cara dawiyê di danûstandinên xwe û PYDê de daxwaza şandeke hevbeş ya kurdî bi beşdariya ENKSê kiriye, û ji şanda PYDê re daye zanîn ku PYDê nûnertiya mîletê kurd nake û herwiha ew berhev nîne danûstandinan bêtî beşdariya ENKSê ligel PYDê bike?.

Yekrêziya tevgera siyasî ya kurdî li Sûriyê û hêzên wê yê leşkerî, her ji demeke dirêj daxwaziyek netewî û cemawerî bû û bi taybetî hev-dem ligel destpêkirina kirîza Sûriyê bû daxwaziyek netewî a bilez ya kurdên Sûriyê û hikûmeta herêma Kurdistanê, û heta radeyekê bû daxwaziyek navdewletî jî ji ber ku gelek aliyên dost ev yek wekî merc ji bo piştgiriya mafên gelê kurd di Sûriya nû de piştaşt kirin û di nav de ji aliyê Amerîka û Rûsya û Fransa hat piştaşt kirin, nemaze ku hewlên serokatîya herêma Kurdistanê her ji destpêkê û heta îro ji bo rêxistina nav-mala kurdî berdewam in.

Îro, piştî dagîrkirina Efrînê û herwiha piştî dagîrkirina Girêspî û Serêkaniyê jî ji aliyê dewleta Tirkîyê û çeteyên opozisyonê ve, ku roj bi roj giringiya yekrêziya kurdî zêdetir dibe, nemaze ku niha amadekarî dibin ji bo diyarkirina destûra nû û çareserkirina kirîza Sûriyê, hev-

Li aliyekê din hewlên Amerîkî û Rûsya hene ji bo peydakirina tîkilî û danûstandinan di navbera Tirkîyê û PYDê de, ku ev nûçe heta ji aliyê serkomarê Tirkîyê hat piştaşt kirin ku Amerîka û li ser zarê serok Trump daxwaza hevdîtinekê di navbera Erdogan û Mezlûm Ebdî de kiriye, û lewra ji bo vê yekê ku pêdivî bi rola ENKSê heye û herwiha ku xweşkirina tîkiliyan di navbera PYDê û rayedarên Tirkîyê de wê bibe faktor ji bo qutkirina tîkiliyên PYDê bi PKK'ê re, ku ev yek jî daxwaziyek navxweyî û herêmî û navdewletî ye.

Yekrêziya kurdî bi taybetî li ser aliyê siyasî û leşkerî bûye pêdiviyek bilez ji bo dabînkirina



mafên gelê kurd di Sûriya nû de, tevî giringiya rola herêma Kurdistanê û piştgiriya wê û berovajî vê yekê ku her hewlek ji bo kêmkirina rola herêma Kurdistanê wê bibe sedemê lawazbûna pêgeha kurdên Sûriyê.

Têbînî: Ev mijar tenê boçûna nivîskar e, û Rojnameya Agirî di hember de berpirsyar nîne

Hepsiyekî siyasî ê Kurd di girtîgeha bajarê Bokaanê de hate azadkirin

Hepsiyekî siyasî ê Kurd yê bi navê “Husên Mehmûdî” piştî lîxweşbûna nû ya dezgeha dadweriyê, di girtîgeha bajarê Bokaanê de hate azadkirin.

Ew hepsiye siyasî di rêketa 26`ê Banemera sala 1396`an ji aliyê hêzên leşkerî ve hate binçavkirin û piştî mehek di girtîgeha îdar-eya Îtîla`atê de bo girtîgeha bajarê Bokaanê hate veguhestinê û piştî bi danîna barimteyê bi awayekî demkî hatibû azadkirin.

Ew welatîyê Kurd, sala 1397`an ji aliyê dadgeha şoreş a bajarê Bokaanê ve, bi tometa “endambûn di gel yek ji Partiyên Kurd yê dijberî hikûmeta Îranê” bi 3 sal hepsa te`izîrî hatibû cezadan û meha Rezbera a wî salî bo cîbicîkirina cezaya xwe bo girtîgeha bajarê Bokaanê hatibû veguhestin.

“Husên Mehmûdî” piştî lîxweşbûna nû ya dezgeha dadweriyê, roja Şemî 23`ê Xakelêwe, li girtîgeha bajarê Bokaanê hate azadkirin.

122emîn salvegera rojnamevaniya Kurdî



N: Nûredîn Sofizade

Rojnameya Kurdistan, yekemîn Rojnameya bi Zimanê Kurdî ye, lewma salyada weşana wê ji aliyê piraniya Kurdan li her çar perçên Kurdistanê, hemû dem û dezgehên ragihandinê û sazî û aliyê siyasî yên Kurd ve, weke roja Rojnamevaniya Kurd hatiye naskirin û di vê rojê de hem yad û rêz ji ked û xizmeta mezin a weşêner û damezrênerê bingeha Rojname Kurdistan tête kirin, hem ev roje bûye xalek bona pêdaçûn û rexne, yan pêşxistina weşana Kurdî.

Lewma bi hilkefta 122'emîn salvegera Rojnamevaniya Kurdî, ez serê xwe li hember ked û xizmeta weşênerê yekemîn ê rojname Kurdî ya bi navê Kurdistan de ditewînim, ku ew jî xêncî "Mîqdad Medhed Bedirxan" û "Ewdirehman Bedirxan", û malbata Kurdperwer û rewşenbîr a Bedirxaniyan, kesê din nîne, û herwisa pîrozbahiyê ji hem û rojnamevanekî Kurd dikim ku di pêxema pêşxistina rojnamevanî û wêjeya Kurd de pêngavek avêtine û xizmet kirin.

Hekî em dênêkê bidine dîroka weşana yekemîn a rojnameya Kurdî bi wî awayî bûye: Rojnameya Kurdistan di 22'ê meha Nîsana sala 1898'an de, ji aliyê "Mîqdad Mîdhed Bedirxan" ve li Qahîreya paytexta Misirê deşt bi weşana xwe kiriye. Deştpeka weşandina rojnameya Kurdistanê, mîna xebateke neteweyî û rewşenbîrî tê nirxandin.

Hejmarên 1'ê heta 5'an li Qahîreyê, ji ya 6'an heta 19'an li bajarê Jinêv a paytexta Swîsê, ji ya 20'an

heta 23'an li Qahîreyê, hejmara 24'an li Lendenê, ji 25'an heta 29'an li Folkîstonê di başûrê Îngilîstanê û ji hejmara 30'ê heta 31'an dîsan li Jinêvê hatine weşandin.

Piştî zexta Osmaniyan li ser Misirê, rojnameya Kurdistan jî bi neçarî gelek cih guherandin. Bedirxaniyan weşandina rojnameya Kurdistanê li hin welat û deverên Ewropayê, domandin.

Piştî "Mîdhed Bedirxan" Beg, "Ewdirehman Bedirxan" Beg xwe da bin barê derxistina rojnameyê, di 47 meh û 22 rojan de, li Sirgûnê di rewşeke dijwar de 31 hejmar hatine weşandin. Di 13'ê nîsana 1909'an rojnameya Kurdistan, ji aliyê Osmaniyan ve hate girtin.

Hekî çî Kurdistanê yekemîn nekarî berdewam be, lê ev bû bingeş û xîmeke qahîm bo weşana Kurdî û roja deştpeka weşana rojnameya Kurdistan îro ji aliyê hemû dezgehên kurdî ve weke deştpeka rojnamegeriya kurdî tê qebûl û pîrozkirin.

Rojnamevaniya Kurdî di her çar perçên Kurdistanê de xwe domderê rojname Kurdistan zaniye û ev kirine rêbaz û jêdera yekemîn .

"Simkoyê Şîkak" û "Ebdulrezaq Bedirxan", bi dû wan de li serdemê Komara Kurdistanê û ji aliyê Hizba Demokrat a Kurdistanê vê li ser heman bingeşê rojname tête weşandin û rojname PDKÎ heman navê Kurdistan dadinê ser rojname xwe.

Wiha û bi van "ayetên hişiyariya gel û civakê" bû ku piştî wê pêngava dîrokî ya "Simkoyê Şîkak" dengê xwe xiste gel dengê "Mîqdad Bedirxan". Yekemîn rojnameya Kurdî di Rojhilatê




Kurdistanê de di çaxê serhildana rêberê navdarê Kurd "Simkoyê Şîkak" li paytexta deştihildariya wî bajarê Urmîyê hat weşandin. Yekemîn xwendingeha Kurdî li bajarê Xoyê, yekemîn komela Kurdî a bi navê "Gihandin" li bajarê Xoyê, yekemîn çapxane a bi navê Kurdistan û yekemîn kovar û rojname Kurdî di çaxê serhildan û deştihildariya "Simko" de bersiva banga serhildana nû a Mîrzadeyê Kurd bûn ku ji "Qahîr"ê heya Urmîyê dengê wî êdî hemû sînor derbas kiribûn.

Hinek jêder didine xuyakirin ku di sala 1908'an çaxê ku agirê şoreşa "Simkoyê Şîkak" li dijî deştihildarên

Îranê germ û gor bû, "Ebdulrezaq Bedirxan" rojnameyek bi her du zimanên Kurdî û Tirkî ku navê wê "Kurdistan" bû, li bajarê Urmîyê diweşand. Lê piştî ku "Ebdulrezaq Bedirxan" ji aliyê Rûsan ve bi dîl ber bi Rûsiya Qeyserî ve hat dîrxistin, serokê Kurd Simkoyê Şîkak ji rewşenbîrê Kurd "Mîhemed Turcanîzade" daxwaz kir ku weşandina rojnameya Kurdistan berdewam bike ku piştî navê wê bû "Kurd". Weşandina rojnameya Kurdistan heya sala 1914'an li bajarê Urmîyê berdewam bû. Rojnameya "Kurd" organ an jî ziman halê rewşa şoreşa Simkoyê Şîkak bû û di hemû hejmarên rojnamê de xeber û nûçeyên wan şerên ku di navbera şoreşvanên Kurd û artêşa dewleta navendiya Îranê de diqewimîn, di nava rûpelên rojnamê de cih digirtin.

Sala 1946'an û di serdema komara Kurdistan û serkomariya "Pêşewa Qazî Mîhemed" de pêvajoyeke nû di jiyana rojnamegeriya Kurdî de deşt pêkir. Komek kesên xwedî şîyan ji rewşenbîrên wekî "Hêmin Mûkriyanî, Ebdulrehman Zebîhî, Hesên Qizilcî, Hejar Mûkriyanî" û dehan kesên din govar û rojname weşandin.

Weke: "Govara Kurdistan,



rojname Kurdistan, gov-ara Helale, govara Girûgalî Minalanî Kurd, govara Awat, govara Hawarî Nîştîman û dehan pirtûk, şano û xebatên din yên çandî û wêjeyî".

Di 122'emîn salvegera weşandina yekemîn Rojname Kurdistan, serê xwe di hember ked û xizmeta "Mîqdad Medhed Bedirxan" û hemû wan kesane de ditewînim ku kevîrek danane ser dîvarê pêşxistina rojnamevaniya Kurdî û pîrozbahiyê ji hemû wan rojnamevanekî Kurd dikim ku bi ked û qelema xwe, xizmeta pêşxistina wêjeya netewa Kurd dikin.

Nerîna Lîderan



“Donald Trump”:

“Rejîma Îran bûye rejîmeke cuda û tenê li pey mana xwe ye”.




“Mike Pompeo”:

“Rejîma Îranê perê next ji bo girûpên Şî'e û Hizbullahê xerc dike”.



Berhem Salih:

“Divê Enfal wek komkujî bê naskirin”.



“Craig S. Faller”:

“Spaha Pasdaran mezintirîn mafyaya madeyên hişber û piştevanê terorîzîm di cîhanê de ye”.

Daxwaz tê kirin DYA ji bo guhertina rejîma Îranê piştevan û alîkar bin



N: Eskender Ceiferî

Li gor raporteke belavoka “Foreign Affairs” ku li Amerîkayê derdikeve, rejîma Komara Îslamî ya Îranê guhertinan qebûl nake û lewma jî ew belavona stratejîk dibêje divê ji bo guhertina rejîmê piştevaniya xelkê bê kirin.

Ew belavok ku li îyaletên cuda yên Amerîkayê derdikeve, girêdayî Civata Pêwendiyên Derve yên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ye û di raporta xwe ya rojên derbasbûyî de tekez kiriye ku li gor nerîna Amerîkiyan, guhertina rejîma Îranê weke vexwarina jehrê û dojahîbûnê ye. Ji ber ku rejîma Tehranê guhertinan lixwe nagire. Eger em li bendê bin ku rejîma Tehranê siyasî xwe biguhere, wê demê me heman şaşî dubare kiriye ku ev çil sal in li wir berdewam dike.

Di raportê de hatiye gotin ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê dixwazin tenê reftarên rejîma Îranê biguherin lê belê ev nerîn û siyasî, şaş in û bi van kiryanan, reftarên rejîmê nayên guhertin. Sedema ku rejîm guhertinan qebûl nake ev e ku ev rejîm, desthilateke radîkal e û lewma jî siyaseta guhertina rejîmê li Îranê bi piştevanî û alîkariya DYA wê zêdetir bi bandor bibe.

Di beşeke din a raporta belavoka Foreign Affairs de behsa hewlên ji bo guhertinê hatiye kirin û tê de hatiye ragihandin ku eger Amerîka rewşeke baş û guncaw pêk bîne, wê demê rejîma Îranê wê biherife. Ji ber ku berovajî îdiaya hin alîyan, êdî rejîm gelek lawaz bûye û dibe ku

aliyên dijber bikarin ji derfetan mifahê bişînin.

Raport di beşeke din de behsa meşên nerazîtiyê yên xelkê Îranê, xebata sîvîl û girseyî ya giştî, nebûna derfetên kar, bilindbûna nirxa kelûpelan, gendelî û hin pîrsgirêkên din dike û dibêje divê derfetan bi kar bin û mifahê ji van derfetan bişînin ji bo ku rejîmê biguherin.

Di dawiyê de jî amaje hatiye kirin ku li gor Foreign Affairs û Civata Pêwendiyên Derve yên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, qet em nikarin bi meleyên Îranê re lihev bikin lewma jî pêwîst e DYA, siyaseta guhertina rejîmê bi kar bin û ji bo lawazkirina rejîma Îranê tevgerên xwe xurttir bikin. Endamên vê civatê, siyaetvan û wezîrên berê yên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ne ku bandora wan heya niha jî di rêveberî û siyaseta derve ya DYA de heye û wek şewr jî hinek caran mifah ji gotar û şîretên wan tê şandin.

Di demekê de ku piraniya opozîsyona navendgir a Îranê wate opozîsyona Farsan ji bo pêşeroja vî welatî lihev nekirine, lê Kurd, Belûç, Azerî, Turkemen û Ereban pêşketinên baş di karê hevpar de hene û çendîn hevbendî ji bo kar û xebata hevpar ava kirine.

Her yek ji van neteweyan jî, cuda kar û xebatên xwe li dijî rejîmê xurttir kirine û didin xuyakirin ku ew xwe ji bo qonaxa piştî rejîma meleyan amade dikin.

Kurd yek ji wan neteweyan e ku bi avakirina Navenda Hevkariyê ya Partiyên Kurdistana Îranê, xebateke hevpar ji bo pêşerojê destpê kirine û herî dawî behsa hevrêziya di navber hêzên pêşmerge yên partiyên endam di Navenda Hevkariyê de jî hate kirin.

Eger ev hewl bi ser keve, Rasan dibe seywana partiyên siyasî yên Kurdistana Rojhilat û bi vî awayî, wê xebat ji bo pêşeroja Kurdistana berfirehtir û germtir bibe.


Kurd zêdetirî Farsan, bi pêşeroja xwe geşbîn in. Ji ber ku hem ew li ser bingeheke hevpar ji bo pêşerojê lihev hatine ku fêdêralî ye, û hem jî bi xalên xwe yên hevpar, dixwazin hêza hevpar jî ava bikin. Eger ev hêz bê avakirin, wê demê wê bingeha avakirina artêşeke netewî ji bo Kurdistana Rojhilat ava bibe.

Tevî ku Kurdan di çil salên derbasbûyî de hertim xebata xwe li dijî dagirkarên Tehranê berdewam kiriye, lê eger aliyên navdewletî jî, ji bo guhertina rejîmê alîkar û piştevan nebin, wê demê riya van partîyan, ji berê diwartir e.

Di van çil salan de rejîma Tehranê hem bi terorîzma navdewletî ku tê de serkirdeyên Kurdan weke Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendi li Ewropayê teror kirin, û hem jî bi piştevaniya girûpên terorîstî, cewher û zata xwe ya perwerdekirina terorîstan nîşanî aliyên navdewletî daye.

Hem bi Rasana Dîyasporayê û hem jî bi civîna derbarên mafên neteweyên nefars û pêşeroja wan li Parlamentoya Ewropayê, ji bo rejîma Îranê û herwisa bo aliyên navdewletî derket holê ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê û Rasan, gelek aliyên xebatê li xwe digirin. Di Rasana Dîyasporayê de daxwaz hate kirin ku rejîma Îranê weke encamdera sereke ya terora Dr. Qasimlo rêberê navdar ê Kurd bê binavkirin. Piştî heyamekê jî birêz Mîstefa Hicrî lêpirayê giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bi nûnerên neteweyên din re li Parlamentoya Ewropayê daxuyanî dan û behsa mafên netewî yên xwe kirin. Her du qonax jî, ji bo Kurdan pir mezin bûn û li bendê ye Kurd kar û xebatên xwe li dijî rejîmê berfirehtir bikin.

Pêwendiyên nasiyonalîzm û nasnameya netewî



N: Bêhzad Qadirî

Nasiyonalîzm (Nationalism) curek agehî ye, wate agehiya ku girêdayê bi netewe wate “agehiya netewî” jî jê re dibêjin. Agehiya netewî berhemanîna heşta “tak”an bi wefadarî û dilgirêdana bi pêkhateyên netewî, wate (Ziman, kevneşop, nîrxên civakî û exlaqî û çand û...hwd) e. Ala, sirûda netewî û hêmayên din ên nasname netewî, hin nîşaneyên gelek girîng in di civatgehên nasiyonalîzmî de. Nasiyonalîzm çi wekî îdolojî bê mêzekirin yan jî tevger û yan jî komek ji siyasetan, bêguman di pirosa pêkanîna guhertin û bi giştî netewesaziyê de roleke girîng û sereke li stûyê wê bûye. Rola nasiyonalîzmê, çi li qonaxa pêş avabûna dewlet-netewe û çi jî piştî avabûn û xwebihêzkirina dewlet-netewe de bi ciwanî tê dîtin.

Nasiyonalîzm, pêwendî û yegirtina di navbera endamên civatgehekê qahîm dike û jî aliyekî din ve sînor û nasnameya wan digel kesên din diyarî dike, da ku xwe cudatir ji kesên din nas bike. Ji her aliyekê ve mêzeyê pêwendiya nasiyonalîz û nasnameya netewî bikin, em bi rohnî dikarin bandora berçav a nasiyonalîz li ser bihêzkirin û yekgirtin û qahîmkirina nasnameya netewî bibînin. Nasiyonalîzm hêza sereke ya afirandina netewan e; Nasiyonalîzm heşta girêdayî ya “tak”an bi komeleke mezintir a bi navê netewe bihêz dike. Nasiyonalîzm dibe sedema bilindbûna hogirî bi sembolan, oştûran, nîrxan, ziman û kevneşopî. Nasiyonalîzm warê piştevaniya xelkê ji dewletan di rewşên hesdar de dabîn dike û di hegera

hebûna gefên mezin, hemû endamên netewe bo piştevanî ji xwe û bo dûrxistina gefan, têne meydane.

Nasiyonalîz wekî handaneke zêde berçav, li nojenkirin û rêniwînkirina heşta emegnasiya “tak”an bi neteweyekê gelek bandordar e, di asteke de ku tak bo parastina warê xwe (ku bi hêza nasiyonalîzmê bi nîştimana pîroz dibe) û hildana alaya xwe, amadeyê cangorîtiyê ne. Nasiyonalîzm di dema nojenkirina heşta netewî de, nemaze di dema krîz an jî gefa derveyî de, hewil dide yekgirtî û yekdem di asta netewe de qahîm bike û biparêze. Nasiyonalîzm di dilê dîrokê de oştûreyan tîne ser şaşê, hemase û pehlewaniyê berê zindî dike, bi cangorîkirin di rêya nîştiman de pîroziyan diafirîne û bi berde-

wamî raz û remza hermanê bi bîr tîne. Nasiyonalîzm dibêje me, yek bin û bo nîrxên yek, bi hemû hebûnanê ve hewil bidin.

Nasiyonalîzma netewî yan medenî ku di hember nasiyonalîzma qewmî de ye, di rastî de heman tişt e ku di piraniya welatên cîhanê de bi awayên cuda cuda wekî mîkanîzma yekgirtî ya nasname û yekgirtina netewî, di hember gefên derveyî de mifahê jê werdigrin. Nasiyonalîzm di vê astê de, li serbixweyî û desthilata dewletekê piştevanî dike û berdewamî di hewil de ye ku nasnameya netewî bihêz bike û biparêze.

Nasiyonalîzm pêkhateyeke girîng û serekî ye li pêkanîna û berdewamiya nasnameyeke hevbeş û agehiya netewî di civatgehên cuda cuda de, û jî



vê rêyê ve jî mana netewekî piştevanî dike. Nasiyonalîzm di asta her welatekê de dikare sedemek be bo vehûnandina baştir a hêz û zêdekirina derfeta siyasî, civakî û aborî. Bi nêrîna piraniya bîrmendan û lêkolerên zaniştên civakî û dîroknasan, nasiyonalîzm dibe sedema yekgirtina navxweyî ya girûpên civatgehê. Nasiyonalîzm diçe dilê dîroka hevpar, û efsane û hemase û oştûre bi zimanekî bihêz û pirr ji bawerî ve pêşkêş dike; Pehlewaniyê dîrokî, neteweyekê bilind radigrin û dibe sedema heştikirina bi serkevtinê (xirûra) netewekê. Nasiyonalîzm li ser nîşaneyên teybet ên netewekî (bi zimanê rêz û pîroz ve) cext dike û di demeke heştîyar de (gef li ser berjwendiyên netewî) ew rêz û pîroziye zêdetir dike; Hin

nîşaneyên wek ala û sirûda netewî bi awayê berdewam di jiyana rojane de tîne berçav û di dema gefan de li ser wan nîşaneyan zêdetir cext dike.

Nasiyonalîzm ji warê nîşaneyan ve, pêka rewşa dem û guherinkariyên civakî, nîşaneyên berê zindî dike û heta nîşaneyê nû berhem tîne, da ku bi wî awayî pêwendî û yekgirtina neteweyek di berê, niha û paşerojê de biparêze. Nasiyonalîzm heta dikare sertir ji dîroka kevin a neteweyekê, hindik ji pendên olî di qalibê oştûre û nîşaneyan bîne derê û jî wan bo yekgirtin û yekxistina netewekê mifahê jê wergire.

Ew nasiyonalîzme ku bi awayekî berdewam, wefadariya hevvelatîyan bi

netewa xwe diparêze û dibe sedema wefadarî û cangoriya wan ji rêya nîştiman ve. Nasiyonalîzm di yek wateyê de, wekî îdolojîyekî siyasî li pey vê yekê ye ku netewe û dewlet zêdetir nêzî yek bike.

karkirdeke bandordar û pozetîva nasiyonalîzm li ser nasnameya netewî û yekparçeyî ya civakî, hewcehî bi bernamedarêjî û endazyariya civakî ya pêçayî û binezîm û dirêj û “dûredîmen” e û em nikarin tenê di rewşên krîz û hebûna gefan de ber bi aliyê

wê ve herin, çimkî: Nasiyonalîzm digel nasnameya neteweyekê di panatiya zimaneke dûrûdirêj de pêwendî heye û mijareke ku xwe berdewam di jiyana giştî de nîşan dide. Di piraniya welatên cîhana sêyem de, bi awayekî demkî mêzeyê hêza nasiyonalîz tê kirin û dewlet di dema krîz û gefa derveyî û navxweyî de, bo parastin û mana xwe mifahê jê werdigrin. Nasiyonalîzm enerjîyeke bihêz heye û ew enerjîya bihêze dibe di rastîya hêza netewî û berjwendiya netewî de, bi “dûrîmanek” e tewaw û di qalibê bernamedarêtîneke stratîjîkî de bi kar bibe. Bi giştî hemû ew tiştên ku di vê gotarê de hetine baskirin, li derheq nasiyonalîzma pozetîv an jî medenî ye ku dikare di rastîya qahîmkirina nasnameya netewî de gelek bandordar be.

Bi giştî em dikarin bêjin ku nasiyonalîzma pozetîv û medenî li bihêztirkirina nasnameya netewî û çareserkirina krîzên pêwendîdar de, gelek karayî heye û dikare bîra pêşketin, avakirin, bilivîn di nav xelk de zêde bike; Helbet ew bi vê yekê pêwendîdar in ku birêveberîyeke aqilane, hûr û bernamedarêjer hebûna wê hebe, û rê bi tundajoyiyê nede. Di welatên modern û pêşketî de, mîkanîzmekî bihêz a din heye ku li yekparçeyiya netewî û yekgirtina nasnameya netewî de bandoreke herî girîng heye, û ew jî mafê “hevvelatîbûnê” ye.

Bê dadwerî li Rojhilatê Kurdistanê



N: Azad Kurdî

Yek ji bingeheên nasîn û ji hev cudakirina hikûmet û deşthilateke demokratîk û tûtalîter, çawaniya karkirina sîstema dadê ye di wê hikûmet û dewletê de. Dadwerî ger serbixwe û sîvîl nebe, diçe çarçoveyeke kontrolkirî û hemû biryarên wê di çarçoveya berjewendiyên wê hikûmetê de derdikevin û pîrensîpên dadê tîn bînpêkirin. Dadwerî li Rojhilatê Kurdistanê çawa hatiye û tê rêvebirin?

Bi vê kurte deştpêk û pîrsê, em dixwazin balekê bikşînin ser çawaniya bê dadweriya rejîma Îslamî ya Îranê li Rojhilatê Kurdistanê di heyamê 40 salên borî de. Şehîde mezin û zana kak « Çeko » di dewreyeke perwerdeyê de ji me re digot: «Bo nasîna raşteqîne ya rejîma Xomêynî pêwîst e mirov tenê hemû qanûn û kiryarên rejîmê berevaj bike, wê demê mirov digîje raştiyê.» Ji roja ku Xomêynî 41 salan berî niha fermana cîhad û qirkirinê li dijî gelê Kurdistanê derkir û heta niha bi hemû awayan berdewam dike, Kurdistan yek ji herêmên dagirkirî yên deşthilata Îranê bûye binkeyeke leşkerî ku di warên siyasî, hiqûqî, aborî û kultûrî

de li rewşeke sitemkarane û dûr ji hemû pîrensîpên demokratîk û mirovî de bi rê ve diçe. Helbet tişteke ji vê yekê zêdetir ji rejîma Xomêynî li dijî gelê azadîxwaz ê Kurdistanê nayê çavnihêrkirin.

Rejîm li Kurdistanê heta digel girtiyên ne siyasî jî cuda tevdigere. Rêje û çawaniya darvekirina girtiyên ne siyasî jî bi tewahî berçav e digel herêmên din ên Îranê. Sedem jî tenê kurdên û xwînmijiya wan li dijî kurdan e.

Piştî ku gotûbêjên şanda hevbeş a tevgera rizgarîxwaziya kurd li Rojhelat digel rejîma Xomêynî bona çareserkirina pîrsa kurd li Îranê di sala 1980'î de gihîşte binbeşt û dawiyê ku Xomêynî



yekalî ew gotûbêj sekinandin û Partiyên Kurdî qedexe ragehandin, êdî rojên reş û tarî li Kurdistanê deşt pêkîrin ku îro jî her berdewam dibin. Fermana Xomêynî ew bû ku nabe rehmê bi kesê bikin li Kurdistanê doza mafên kurdan dikin. Pasdaren hov û cinayetkar wek Xelxalî hatin Kurdistanê û kom kom xelk girtin, îşkenceyên herî hov dikirin û îdam û şehîd kirin. Heta niha ew rêbaz li Kurdistanê tê meşandin. Li ser vê bingehe, ji bo ku ev celad û cinaketkar dadê bikin sîper bo hovîti û cinayetên xwe, bi nav dadgehên Îslamî yên rejîmê ava kirin. Li her dadgehekê pasdarekî rindîndar û melayekî kevnepereşt ku heta ser heştî dijî gelê kurd bûn, diyarî kirin ku heta niha jî herwisa bi rê ve diçe.

Lê li Kurdistanê qet dadgehan biryar li ser girtiyên siyasî nedane û nadin, ev Wezareta Îtîla'at û Spaha Pasdaren rejîmê ye ku biryaran li ser girtiyên kurd derdikin. Tawan Kurdên e. Girtiyên kurd dema çend mehan di bin îşkenceyên herî dijwar û hovane de dimînin, piştî bo dema çend deqîqeyan û bê paraştina hemû pîrensîpên huqûqê û mafên berevanî jixwekirinê û bêy hebûna parêzer biryarên Wezareta Îtîla'at û Spaha Pasdaren Îranê li ser wan disepînin.

Xaleke din a bê dadweriyê li Kurdistanê gellek berçavtir e, kuştina sîstematîk a sedan kasibkarên kurd e di salê de ye li sînorên Kurdistanê. Kasibkar bi teqeya raşteraşt a hêzên çekdar ên rejîmê tîn kuştin û birîndarkirin, bêtir ku mafê dozvekirin li dijî hêzên çekdar ên kurdên rejîmê hebin ! Tirajîdiya kuştina kasibkaran bo mirov diselîmîne ku kurdên çiqas tawaneke mezin e li Îrana Xomêynî.

Hepsiyekî siyasî ê Kurd ji girtîgeha bajarê Bokanê hate azadkirin

Hepsiyekî siyasî ê Kurd yê bi navê “Husên Mehmûdî” piştî lîxweşbûna nû ya dezgeha dadweriyê, di girtîgeha bajarê Bokanê de hate azadkirin.

Ew hepsiye siyasî di rêketa 26'ê Banemera sala 1396'an ji aliyê hêzên leşkerî ve hate binçavkirin û piştî mehek di girtîgeha îdarîya Îtîla'atê de bo girtîgeha bajarê Bokanê hate veguhestinê û piştî bi danîna barimteyê bi awayekî demkî hatibû azadkirin.

Ew welatîyê Kurd, sala 1397'an ji aliyê dadgeha şoreş a bajarê Bokanê ve, bi tometa “endambûn di gel yek ji Partiyên Kurd yên dijberî hikûmeta Îranê” bi 3 sal hepsa te'izîrî hatibû cezadan û meha Rezbera a wî salî bo cîbicîkirina cezaya xwe bo girtîgeha bajarê Bokanê hatibû veguhestin.

“Husên Mehmûdî” piştî lîxweşbûna nû ya dezgeha dadweriyê, roja Şemî 23'ê Xakelêwe, li girtîgeha bajarê Bokanê hate azadkirin.

Nivîskar “Tosinê Reşîd”, li ser Mestûre Erdelanî romanek nivîsî

Nivîskar Tosinê Reşîd, di boneya dusedsaliya jidayikbûna Mestûre Kurdistanî de, ev roman nivîsî.

Romana: Mestûre (serê wê hêjayî tacekê bû) ji waşanên çapxane ya RONAHI, ji 300 rûpelî pêk tê. Du beş jê yên sereke ne û 25 navnîşan şaxî ne. Beşa yekemîn (Emanalah xan: Rêwîyê dîrokê - Mîrgeha Erdelan - Kur û bav - Meclîsa derwêşan - Raşt-hatin li pirtûkxaneyê- Şayî - Neynik-Li Silêmanî'yê- Mîrina Emanalah Xan - Xosro xan walî- Dîsan şer) û beşa duyemîn (Mah-Şeref Xanim Kurdistanî: Di navbera nemerdî û mirinê de- Şahîya bê şabûn- Xelayî li Kurdistanê- Yeketîya pîroz- Bi sipartina Şah- Çûma- Mam Xosro- Derdê bê derman- Dema diltengîyê- Riza Qulî Xan- Ehmed Paşa- Deştî Merîvanê- Rev ji Senedecê- Li xerîbîyê.)

Di vê romanê de jiyana Mah-Şeref Xanimê (Mestûre Kurdistanî) bi şeweyekî pir xweş, hêsan û bi zimanekî zelal û peyvîne bijartî, ji gelek aliyan ve tê vekolînkirin- zaroktî, mezinbûn, hevjinî, penaberî û mirin. Tiştê herî balkêş di vê romanê de ew e, ku xwendevan di mîkanîzma rîstina bûyerên wê de qet şaş nabe.

Ev yek jî bêguman encama çêxweşiya wêjeyî ya di lihevanîna diyalogên romanê de ye.

Herwiha xweşçêkirin, başpêşkêşkirin û rastrêzkirina bûyer û kesayetan yê di diyalogên romanê de jî rola bixwevegirêdana xwendevên dilîzin.

Xwendevan her û her li pê tîşikana xwe ya balkêşiyê dikeve ,tu dibêjî qey hevok û peyv bi te re dipeyîvîne û hêdî hêdî te dikişînin xwe .

Yeka din jî ew e sazkirina hevok ,diyalog û bûyeran bandora xwe dide ser xwendevên û wî dike rewşeke wekî di wê serdemê de dijî û bi bûyeran re mezin

dibe ,wek çawa bîranîn tê ber çavên mirov ew jî wisa dibe.

Lê hêjayî gotinê ye, ku tevî ewqas xweşî û serkeftin di bijartina kesayet, diyalog û monologê de jî, nivîskar dikeve çend pîrsgirêkan. Ew di pêşkêşkirina hin bûyeran de, ne serkeftî ye û gava xwendevan dixwîne ji xwe dipirse gelo çi pêwîstiya romanê bi vê bûyerê an bi vê kesayetê heye?!


Wek kesayeta bi navê (Perwîz) ya ku di binî navnîşana (Meclîsa derwêşan) de tê pêşkêşkirin, ku ew derwêşek e û di warê pînekirina solan de dixebite.

Ta dawiya romanê jî, ti armanc ji hebûna vê kesayetê di nava romanê de, xuya nakin.

Ya din jî ew - ku ez dibînim pîrsgirêkeke mezin e- pir caran tê xuyakirin, ku nivîskar giraniyê bêhtir dide dîroka bûyerine din ji bilî dîroka M.Kurdistanî û galegala li ser wê. Carine jî digihe aştêkê, ku mirov dikeve gumana nêvlêkirina romanê, wek beşê yekemîn ku giraniya xwe li ser bûyerên dîroka Senedecê , avakirin , rêbertî, şer û pevçûn, û Emanalah Xan walî. Ji bilî wan bûyeran hinekî li ser kesayeta sereke ya romanê (Mestûre) gotûbêj dike.

Lê di beşa duyemîn de vedigere û vê pîrsgirêkê hîn baştir çareser dike bi dayîna girîngî û giraniyê bêhtir li ser kesayeta Mestûre û bêhtir sekîndina li ser bûyer û serpêhatiyên wê.

Kêmasiyek din ku bala min kişandî jî ew bû, nenivîsandina ti berhemên kesayeta ku roman li ser hatiye nivîsîn. Tevî ku ew kesayet bi xwe helbestvan û dîroknivîs bûye!



Ne helbestek ne jî perçeyek ji nivîsên wê.

Ji bilî du-sê malikan -ew jî bi rengêkî şermokîn derbas dibin, heta mirov pê nahise, wek mînak di beşa duyemîn di bin navnîşana (Derdê bê derman) çend malik derbas dibin :

“Li padîşahiya aqilbendiyê ça serok, ez im, jin, hatime bijartin

Ji bera jina ya bindest, vê dewrê kes tune tayê min

Serê me yê hêjayî tac e, em bin çarşevê vedişêrin

Çi fêde ji wê ku bextê min, ez awa nuxsan kirim

Bi destûra Xwedê diloan, ji min re dikeve bêjim

Kubariya evê dema me, rûsipîtiya dewranên ez im..”

Di nêrîna min de, baştir ba ku nivîskêr di dawiyê de jêderên dîrokî jî li bîr xistibana ji ber ku ev romanek dîrokî ye û tê de pir hijmar wek sar û çax derbas dibên pir bûyerên ne ji xeyal û ramanê nivîskêr in.

Lê tevî van pîrsgirêkan, ya durîst ew e ku em hêjatiya vê berhemê ji bîr nekin. Ev romaneke wiha ye, ku mirov dibe demên berê û dîrokeke tijî serkeftin û têkçûn bi mirov dide nasîn.

Berhemeke dewlemend û tijî pend e, divê mirov ji xwendina wê bê par nemîne. RÛDAW

Dadgehîkirina tawanbarekê



N: Elî Munezemî

Ji heyama piştî xilasbûna şerê duyemîn yê cîhanê ve heya îro çend caran dadgehên navnetewî, li ser bingeha beşa 7'emîn a çartêra Neteweyên Yekbûyî, bo pêragihîştin bi doza sûçên tawanbarên mezin hatine lidarxistin, ku dadgeha Norînbêrg (Nürnberg)ê di wî warî de yekemîn bû. Ew dadgeh bo darizandina rêberên «Nazî» yên Almanî pêk hatibû ku li ser sûçên afirandina cinayetên li dijî mirovahiyê, koçberkirina bikom, tundûtîjî, îşkencekirin, kuştina xelkê bi sedemê nemirovane û jînosaydê (eng. genocide) bi biryara Brîtanya, Fransa, Dewletên Yekbûyî ên Amrîka û Rûsya pêk hat.

Dadgehek din ku bo sûçdarê Nazîst, Adolf Aysmen, li «Orşelîm»ê pêk hat, yekek din ji wan dadgehên bi-navûdeng e, ku tawanbarek bi wan sedemên ku li serve hatin bilêvkirin, pêk hat. Ew dadgeh ne dadgehek navnetewî bû, lê ji berku pêvajoya û biryara wê dadgehê bû sedemê peyda bûna şiroveyek felsefî bi nêrînek nû ji aliyê Hana Arênt (Hannah Arendt) ve, xwediyê giraniyek xasmanî ye. Hindek dadgehên din jî yên navnetewî li pêxema lêkolîn li sûçên cinayetkaran pêk hatine ku em dikarin amaje bi dadgehîkirina «Slobodan Milošević» (Slobodan Milošević), dadgehîkirina sûçdarên cinayetên li Ruwanda qewimîbûn û herwisa ew cinayetên ku Erebe Sûdanê li bin rêbertiya Umer El-Beşîr

li dijî xelkê Darfûrê ku xwazyarê bideştveanîna mafê xwe yê çarenivîsê bûn, pêk anîbûn, bikin.

Lê gelo em ji xwe napirsîn ka rejîma Îslamî a Îranê, û bixasmanî rêberê wê rejîmê, anku Ayetullah Elî Xamineyî, wê yekê pêşbînî nake ku di dadgeheke navnetewî de bête dadgehîkirin?

Bo bersivdana wê pirsê han, dibe em bizanibin ku li gorî kîjan heger û argûmentan ew jî vê yekê heq dizane, ku were dadgehîkirin.

1. Elî Xamineyî ku rêberê herî payebilind yê rejîmek tûtalîter e, li gorî benda 5, 107, 109 û 110 ya yasaya bingehe ya rejîma Îslamî a Îranê, ew payebilindtirîn rêberê cîbecîkar di Îranê de ye, ku berpirsiyarê giştî yê hêzên çekdar e, siyasetên rejîmê ew li rêka konseya deştîşankirina berjewendiyên rejîmê ve dadirêje, li ber ku xwediyê «welayeta Mutleqe» ye, siyaset û bernameyên rejîmê yên serveyî zagonê jî, dikare deştîşan bike û zaf deştîlatên din. Eva tê wê wateyê ku ew berpirsiyarê yekemîn e li hemû ew cinayet û sûçên ku ji aliyê karbideştên Îranê ve, di bin deştê wî de dixebitin. Jiber ku gava ku bixwe pêşiya karbideştên hikûmeta xwe negirtiye, ku cinayetên nekin, wate yan wî bixwe fermana wan karan daye, û yan jî bixwe pê xweş bûye. Li ber vê hindê jî cezayê wan cinayetên dikeve stûyê wî: Şer li dijî neteweyên bindest ên Îranê, komkujî, kavilkirina gundan û malên xelkê û mecbûrkirina wan derheq bicîhêlana warê xwe, qedexekirina partiyên siyasî, li sêdaredana girtiyên siyasî, medenî, jinên ducanî û zarokan, îşkence û deştîrêjîkirin li ser hepsiyan, kuştina girtiyan di bin îşkenceyê de, terora cudabîr û çalakvanên siyasî, kuştina xwendekaran, kuştina kesên sivîl ku dengê nerazîbûna xwe bilind dikin.

Heta niha 65 caran Îran bi sedema bînpêkirina mafê mirovan ji aliyê konseya giştî ya rêkxistina neteweyên yekgirtî ve hatiye mehkûmkirin. Ew yeka wê wateyê dide ku rejîma Îslamî bi şeweyek sistematîk aştî û aramiya hevvelatîyan têk dide û çi hurmetek bo maf û azadiya wan wek mirov dananê.

2. Parvenekirina erdê tevî xelkê ku wek wan hizir nakin li ber hegera tûtalîtarîsmekê ku bingeha wê li ser du faktorê şovînzîma Fars û ola Îslama Xomeynîstî hatiye danîn. Li ber vê hegerê ye ku zêdetir li 16 milyon hevvelatî hatine koçberkirin. Her ew siyasete ye ku hindik car karbideştên rejîmê tînin ziman û dibêjin ku «yên ku naxwazin li gorî nîrxê rejîmê jiyan bikin, dikarin herin». Ew siyaseta ku li ser hevvelatîyan tê meşandin, di rastî de heger ji deştê karbideştên rejîmê were, yê li dijî hemû mirovanetiyê bimeşînin. Li ber hindê jî ew cinayetên rejîmê, dibe wek cinayet li dijî mirovanetiyê werin dîtin ku li ser xelkê Îranê tene ceribandî.

3. Ew siyasetên aborî-civakî ku rejîm di bin berpirsiyaretî û rêberiya Elî Xamineyî de dimeşîne, bûye sedemê hindê ku xelkê tûşî zaf pîrsgirêgên civakî-aborî bibin û ew yeka etmosferekê biafirîne ku civak nexweş bikeve. Bilindbûna asta laşfiroşiyê, bikaranîna madeyên hişber, kirîn û firotina endamên laşê mirovan, firotina zarokan û zaf cinayetên din, jînosaydeke spî ye ku di encama siyasetên rejîmê de hatiye pêkanîn.

4. Komara Îslamî siyasetek girtiye ber xwe ku bikaribe xelkê Îranê ji hemû aliyekê ve bi rejîmê ve girê bide, wan li hizir û nîrxên mirovanetiyê û takekesî betal bike, û bi wê hindê hem wateya jiyanê li cem wan tine bike û hem jî wan ji hev bike bîhanî. Dixwaze hemû kesê di nav



rejîmê de bihelîne û wan li tevî hîlbijartinê nemumkun bine rastî hev. Bi vê hindê ne tenê nahêle exlaqê pêş bikeve, belkî exlaqê dîkuje û hindurê mirovan betal dike û nîrxê xwe dixe şûnde. Bi vî karî mirovan ji xwe re dike mohre. Karameta wan jê diştine û hemûyan wek mirovkujan perwerde dike. Nahêle kes bi axave. Dengê dijber mat dike. Ji berku eger kesek neaxave, nikare hizir bike û kesê hizir jî neke, nikare bizane ka çi dike. Ew yeka li dijî plûralbûna mirovan e, jiyana taybetiya xelkê jî her wek jiyana wan ya siyasî dixe bin xeterê.

5. Têkdana aştî û tenahiyê di zaf welatên cîhanê de li rêya piştevanî ji grûpên terorîstî, teqandina bomban, pişikdariya raşteraşt li şer û pîrsgirêkên navxweyî û... hwd. Ew yeka bi eşkere nîşan dide ku rejîm di cinayetên şer de rolek ektîv dîbine û para wê di cinayetên şer li Yemen, Sûriyê, Lubnan, Îsraîl, Îraq û Kurdiştanê de heye.

Encam:

Komara Îslamî di heyamê zêdetir ji 40 sal temenê xwe de bi pêkanîna rejîmeke cinayetkar û tewawiyetxwaz bûye sedemê pêkanîna jînosayd, cinayet li dijî mirovanetiyê û cinayetên şer û deştîrêjî bo ser axa welatên din. Karbideştên wê rejîmê her yek li gorî beşdariya xwe li wan cinayetên de dibe rojekê werin dadgehîkirin. Ayetullah Elî Xamineyî ku rêberê wan cinayetkaran e, berpirsiyaretiya sereke di afirandina wan cinayetên de heye. Bi hêviya wê rojê ku dadgehek navnetewî bo darizandina wî pêk were.

Pêşmergeyên spîpoş di çeperên tendirustiyê de

